

Zimanê wergêrê terbiyeya wêjeyê ye



Nizamettin Akkurt

Di mijara wergêrê de zimanê kurdî zêde ne dewlemende. Mirov bi hêsanî dikare bibêje wergêrên ku ji bo zimanê me hatine çêkirinê, jimara wan ji çend dehan derbas nabin. Piştî salên 90-î hinek mînakên balkêş derketine holê. Pêşiya wê demê jî kêma jimarek hebûye. Bi giştî lawazbûn û kêmasiyek berbiçav di vê mijarê de heye. Her wiha çendî ku hinek kes weke takekes bi vê mijarê re mijul bibin jî, giringiyeka çawa ku dihê xwestin, nehatiye dayîn.

Gelek sedemên vê yekê hene. Sedema bingehîn jî bi jiyana siyasî û civakî ve girêdayî, tunebûna bazara berhemdariya zimanê kurdî ye. Divê bihête gotin ku ev salên dawî ne tê de di berê de bazareka berhemên zimanê kurdî ku karibin xwe piyase bikin û bi vê yekê ve girêdayî karibin xwediyên weşanxane û wergêran têr bikin, pêk nehatiye.

Lê belê, di vê nivîsê de ezê ne li ser wan sedeman, bi temamî ezê li ser kêmasiyên wergêrên ku hatine kirinê bisekinim. Wê ev çavpêketina min zêdeyî li ser bingehê kêmasiyên binkeya ziman û hinek kêmasiyên raman û nêrînên çewt ên wergêran be.

Zimanê kurdî ji aliyê wergêrê ve nû ye, teze ye. Ev tazebûn ji aliyekî ve hinek avantajan û ji aliyekî ve jî hinek dezavantajan bi xwe re tîne. Baş bikaranîna zimên weke avantaj dikare rengê zimanê me him ji aliyê rengê pêşveçûna civakê û him jî li ser firehbûna sînorên cîhana fikrandina takekesî bi awayê erênî bandor bike û helbet xirab bikaranîna zimên jî weke dezavantaj dikare hem li ser geşbûna civakê û hem jî firehbûna asoyên merivan bandoreka nebaş pêk bihîne. Ev pîvera nazik ku mirov dikare bi hêsanî bi hevokê pênase bike, di halê jidestfilitandina wî pîverê nazik de, dê encam bibe kareseteka zimên, lê di halê rastbikaranîna wî pîverî de jî, dê cîhana wêjeya kurdî geş bibe.

Di cîhanê de qet mînak nîne ku welatek tenê bi wêjeya xwe pêş ketiye. Dîsa mînakek nîne ku wêjeyek, ji wêjeyên din xweser pêş

ketiye û nexasim xwe gehandiye radeya wêjeya gerdûnî. Lewma wêjeya ku bi zimanê kurdî dihê afirandin nikare xwe ji wêjeya cîhanê xweser bihêle û di ser de jî nikare bêyî wê bi awayekî hevdem pêş bikeve. Wê gavê mirov dikare bipeyîtîne ku yek ji bingehîn gavên pêşketina wêjeya hevdemî wergêre. Raste ne gaveka serekeye lê gaveka bingehîn û girînge.

Vêca ev gava hanê ji aliyê dewlemendbûna wejêyê ve xwedî bandoreka zor mezine. Nivîskarê ku di sînorên wêjeya xwe ya heyî de hizir dike, xeyal dike û dixwaze biafirîne, ew nikare weke wî nivîskarî xweşik biafirîne ewê ku sûtê ji wêjeyên din yên cîhanê werdigire.

Wê gavê ev yeka hanê raste ku em bibêjin: çawa ku wergêr bi kêrî pêşveçûna civakê û takekesên nav civakê dihê ku ew xwendevan û civak hemû ji wê berhema wergerê sûtê werdigirin, di heman demê de nivîskar bi xwe jî sûtêka berbiçav jê werdigirin. Nabe ku nivîskar xwe ji wê sûtê bêpar bihêle. Berjewendiyên nivîskar rê nadin vê yekê. Na heger ew bi zanebûn xwe li derveyî wê bazina sûtê bihêle wê gavê jî çî mayîndebûna nivîskariya wî namîne û helbet wê afirandina wî ne serincrakêş û hevdem be.

Heta demek dirêj, nivîskariya kurd bi vê çendê nehesiya bû. Wî xwe bi wêjeya cînarê serdest ya ku xwestiye û dixwaze wî asîmîle bike têr kiriye. Bi ya min vêga jî rewş ne ew hinde ronahî ye. Beşek nivîskarên kurd erebî dizanin û hema bêje wergerên hemû wêjeyên din ji bo erebî hatine kirin, têne kirin, beşek jî bi tirkî û farisî dizanin û bi heman awayî bi jimareka zor werger di zimanê tirkî û farisî de hene. Lewma nivîskarê kurd pêdivî bi xwe re, ji bo wergera zimanê xwe nabînin. Nexasme werger ji hinek nivîskaran re weke tiştêkî bê wateye, aşkire dibêjin, ev berhem hatiye wergerandin ji bo zimanê tirkî, yan jî erebî, êdî pêwîst nake ji bo kurdî bihête kirin. Mixabin eva hanê ew berjenge ku nivîskariya em qala wî dikin, ew bi wêjeya serdest bi gotineka rasttir bi wêjeya ku heyîna wî napejirîne, xwe têr hest dike. Nivîskariya ku ne li ser bingehê wêjeya xwe rabe, ne çî nivîskariye, nikare xwe bigehîne radeya wêjeya cîhanê. Halê me kurdan li holê ye. Zêde rave pêwîst nake. Nivîskarê me yê herî bi navûdeng bi xwe re hêz nedîtiye ku derkeve ji kopiyabûna wê wêjeya serdest ya ku pê re radibe.

Bingehîn mercê avabûna nivîskarên hevdem û yên xwe gehandine radeya wêjeya cîhanê bi xwe re firehbûna bergeha wêjeya xwe pêwîst dike. Ku mirov li ser bingehê wêjeya xwe rabe, hingê nivîskariya rastîn pêk dihê. Jê wêdetir pûçe û ne resene.

Helbet li gel me kurdan cihê seyre, li welatên dîtir ji bo wergêra pirtûkan pare didin nivîskaran ku wî karî bikin, li cem me kurdan jî, ji nivîskarî ji bo wergêrê daxwazeke belaş dikin, weşanxane xwe

nêzîkê nakin, yan jî di ber serê xwe re diavêjin. Li welatê Swêdê bi hezaran pirtûkên zarokan ji bo zimanê swêdî hatine wergerandin. Ez wan pirtûkên din najimêrim. Zarokekî swêdî hetanî dihê 10 saliya xwe ne kêmi sed çîrok, serpêhatî û qiset hîn dibe, yên ku malbata wî jê re xwendine û yên ku wî xwendine. Ez nabêjim zarok, lê kîjan takekesê kurd sed çîrok bi zimanê xwe xwendine. Sînorê xeyalkirina wî zarokê li kê derêye û ya takekesê me li kê derêye?

Vêca ku ew wergerên ji bo ziman û wêjeya kurdî bihêne kirin ji aliyê ziman ve ne bi rêkûpêk bin, wê bandoreka xirab li ser şewegirtin û avabûna kesan çêbibe. Ji ber ku ziman roleka mezin werdigire di karê wergerê de.

Zimanê wergerê perwerda wêjeyê ye.

Mirov zarokekê bi kîjan perwerdê xwedî bike, dê jiyana wê/î zarokê/î di bingehe çawabûna wê perwerdê de pêş bikeve. Perwerde kêmi be, dê zarok ji rê derbikeve û ku perwerde rast be, dê zarok di rêya rast de kartêker be.

Helbet di aliyê bikaranîna zimên de çewtiyek heye. Ev çewtî xwe dispêre ser nêrîna ku angaşt dike û dibêje divê sedî sed awayê pênasekirina zimanê kurdî bi kar bihên. Ez "awayê pênasekirinê" di wateya avakirina gotinan de bi kar dihînim. Weke mînak di zimanê erebî de tiştêk dihê gotin gelo di kurdî de ew çawa dihê gotin, mebesta min ji awayê pênasekirinê ev e. Ya rastî jî ew e ku hetanî derfet hebin dive dewlemendiya zimanê kurdî bikar bê. Ji aliyê îdyoman ve, tabîrkirinê ve û qaliban ve divê kurdî baş bi kar bihê. Ev tiştên rastin. Mirov nikare yekser qalibên zimanê dî derbasî zimanê xwe bike. Lê belê divê ev yek nebe asteng li pêşiya dewlemendkirina zimanê kurdî. Em dizanin ku kurdiya me ji aliyê razberkirinê (abstraction) ve nehatiye pêşxistin, lawaz maye. Heger em dibêjin wateya wergerê dewlemendkirina zimanê me ye, divê em ziman ji vê bêpar nehêlin.

Pirs eve, heger em sedî sed qalibên zimanê xwe bi kar bihînin, yanî qalibên heyî bi kar bihînin wê çawa ew ziman pêş bikeve?

Raste werger bi temami ne sudwergirtina bikaranîna zimêne. Di wergerê de du alî hene, yek naveroka tekstêye û du jî bikaranîna zimêne. Naveroka tekstê dibe ku hizrekê bide me, yan jî di mijarekê de me ronahî bike, lê bikaranîna zimên bergeha meriv fireh û geş dike ku ew mezinkirina cîhana xeyalê ye. Naveroka tekstekê ku em dixwînin dibe ku ji me re bibe çîrokek, lê dewlemend bikaranîna zimên dihê ku em karibin cîhana xeyalên xwe, cîhana gelaleyên xwe pênase bikin û wan bigehînin afirandinekê. Berhemdariya meriv ya bikaranîna zimên çend dewlemend be mirov dikare ew hinde ramanê pêş bixe û li ser bingehe xeyalkirinê biafirîne. Di encamê de wêje bi xwe hunera xweşpênasekirinêye.

Ji ber vê çendê hetanî ji me bihêt, em karibin hin "awayên pênasekirinê" yên zimanên din, ji bo zimanê xwe qazanç bikin başe. Em dizanin ku zimanê me di warekî teng de maye. Qalibên ku hene zêdetir bi şênberiya jiyane ve girêdayî ye (concrete). Ji bo hizrandinnek fireh, ne têr û teselin. Weke mînak ji bo gotin yan jî pênasekirina tiştêkî çend zêde awayê gotinê, yan jî yên pênasekirinê hebin, ramana meriv ew hinde zêde pêş dikeve. Ji ber vê çendê qazanceka wisa ji bo zimanê me ne ziyarbexşe, berûvajî karekî zor başe. Divê em qebl bikin, hin awayên pênasekirina tiştan li ba kurdî tunene. Bi awayê herî rast em dikarin çawa wî tiştî bi kurdî pênase bikin, heger werger vê yekê ji xwe re bike armanc wê gelek serkeftî be. Serkeftin bi dewlemendbûnê pêk dihê.

Helbet, ji bo serkeftina wergerê di pîlana duyem de rast bikaranîna zimên heye. Bi taybet di wergerên zimanê kurdî de çewtî gelek dertên pêş. Her wiha divê em di serî de diyar bikin ku wergêra zimanê kurdî ji ber hebûna zayendê ji wan zimanên din gelek zehmettîre. Helbet zehmetî weke ku diyar dibe di serî de di mijara zayendê de û pê ve jî girêdayî di peyvsaziyê de pêş dikeve.

Di zimanê me de dihê zanîn ku navdêr dihêne tewandin. Ji bo tewandina navdêran di zimanê me de rêgezeka sînoren wê diyarkirî tune. Mirov dikare bahsa "aweyan" bike. Weke awayekê ku navdêr dengdêra stûr û gilover di xwe de peyda bike di hundir de dihê tewandin, weke mînak gavan dibe **gavên**, şivan dibe **şivên**, mast dibe **mêst** û hwd.

Di vê mijarê de sereke çewtiya ku dihê kirin di tewandina şaş ya navdêrên taybetî, ya navdêrên takekesan de ye. Di zimanê kurdî de navdêrên taybet yên takekesan ji navên pêş û paş pêk dihên. Weke Ehmedê Hesên, Mistefayê Usiv, Salihê Kerîm û hwd. Ev navên bi vî cureyî paşnavên xwe ji navê dê û bavê xwe digirin. Di bingeh de reseniya wan navan weke Ehmedê kurê Hesên, Mistefayê kurê Usiv û Salihê kurê Kerîm in. Hindek çar jî paşnav ji navê devera ku jê ne pêk dihên, weke Ehmedê Amedî, Mistefayê Dêrîkî, Salihê Efrînî û hwd. Lê belê gelek çar ev yeka hanê çewt dihê nivîsandin. Weke Ehmed Hesênî, Mistefa Usivî û Salih Kerîmî dihê nivîsandin. Ev çewte. Heger paşnav ji navê herêmê be jixwe paşgira xwemaliyê werdigire. Pêwîst nake ku mirov vê paşgirê li ser navê tewandina navdêran derbasî ser navên taybet bike. Ji ber qedexebûna zimanê kurdî li Bakûrê Kurdistanê paşnav bi gora zimanê tirkî pêk hatine. Ev jî tê de hemû pêşnav û paşnavên taybet yên biyanî nabe ku bihêne tewandin weke Barack Obamayî, Ehmed Tirkî, Abdullah Gulî û hwd.

Peyvsaziya tevna roman û kurteçîrokan girînge. Di gelek zimanan de pênasekirina awayê axavtina takekesan di dawiya gotina wî kesî

de dihê çêkirin. Lê belê di zimanê kurdî de ev yeka hanê di pêşiya axavtinê de cîh digire. Weke mînak *Baran got: "ez naçim malê"*. Em bi çî awayî nikarin hevokê bi rengê *Baran: "Ez naçim malê" got*, binivîsin. Wergereka bi vî rengî çewte û li zimanê me nayê. Bi taybetî li welatê Swêdê di navbera salên 80 û 90-î de gelek pirtûk ji bo zimanê kurdî hatine wergerandin û bi piranî di hemûkan de jî ev kêmasî heye.

Di wergera ji bo zimanê kurdî de çewtiyeka berbiçav di mijara **qedîneka nebinavkiri** de heye. Weke ku dihê zanîn qedîneka nebinavkirî li ser bingehê zayendê pêk dihê û paşgirên cinsê zayendê li ser xwe kamil dike. Rengdêrên ku vedigerin ser navdêrê dibe ku ji yekê zêdetir bin. Lê belê rêpîvana qedîneka nebinavkirî nayê guhertin. Heman rêpîvan derbasdare. Ew rêpîvan jî ewe ku rengdêrên ku vedigerin ser navdêrê bi gor zayenda navdêrê qertaf werdigirin. Nabe ku mirov kurt lê bide û wê tewandina zayenda navdêrê nîşan dide nenivîsîne. Weke mînak *kundirekî sor î gilover î nepixî*. Dîsa mirov dikare vê hevokê bi rengê *kundirekî sor û gilover î nepixî* binivîse, lê belê mirov nikare vê hevokê bi rengê *kundirek sor î gilover î nepixî* binivîse, ji ber ku çewte û zayenda navdêrê nehatiye diyarkirin.

Divê ew kesê ku wergêrê dike ji bîr neke ku hin taybetmendiyên bingehîn yên zimanê me hene û nebicîhanîna wan, dê bihêle ku ziman ji vê yekê tuşî ziyaneke mezin bibe. Her wiha wergêr divê di wergêra xwe de gazîkirina hemû devokên ku hene ji xwe re bike armanc û nekeve nav wê bazina teng ya devokekî bi tenê. Di nav me kurdan de mêyla serdestkirina devoka xwe heye. Her takekesê kurd kêr zêde wisa dihejmire ku devoka wî ya herî raste û di şûna peyv û gotinên gelemperî de yên devera xwe û nexasme yên gundê xwe bi kar dihîne. Wergêr nikare devoka xwe bike cihê serekî. Heger mebest newendakirin û bikaranîna hinek peyvên deverî be, ew kes dikare di deqên xwemalê xwe yên wêjeyî de wan bi kar bihîne, lê ne di yên wergerê de.

Weke dawî divê bê gotin ku ne raste ku mirov di wergerê de awayê yekeyek bişopîne. Wergera bi rengê peyv bi peyvê li zimanê kurdî nayê. Dibe ku mirov karibe hinek hevokan peyv bi peyv yanî weke yekeyek werbigêrîne, lê heger piraniya wergerê xwe bispêre vî awayî çewte. Avabûn û peyvسازیya kurdî rê nade vê yekê. Di destê yekê de divê mirov wan awayên ku di kurdî de têne gotin bişopîne. Na heger ew awayê gotinê di zimanê me de tunebe, wê gavê wergêr dikare di bingehê rêziman û rastnivîsa kurdî de awayê gotinê diyar bike. Em ji bîr nekin ku wergêr neçare kûr bihizire û wê vegotina kurdiyê bibîne, ya herî xweşik, şahîk û fêmar.